

Pispor li gorî cerebeyan: Pênc şîretên Mohammed ji bo fêrbûna inglîzî

Cerebeya Mohammed

Mohammed li Sûriyeyê heta sala 11an çûye dibistanê paşê ew bi malbata xwe re ji ber şer ji warê xwe bûye û çûye Misirê. Li Sûriyeyê li dibistanê sala pêncan yan ya şeşan dest bi fêrbûna inglîzî kiriye lê ji ber ku ev ne dersekî wî yê hezkirî bûye, pêşketina wî çênebûye. Li gel ku wî dixwest şiyane xwe yê zimanî bi pêş bixe, wî qet xeyal nekiribû ku ew ê her roj bi inglîzî biaxive.

Em werin roja îro- Mohammed salekê li UKê ma û li gel ku çend mehan beriya qedexeyên Covid-19ê hatibe jî inglîzîyeke gelekî herikbar diaxive. Gelo çawa çêbû ku Mohammed tenê çend peyvên inglîzî dizanî niha gelekî baş diaxive? Ev çavkanî ya şîretên Mohammed e ku armanca wî ev e ku motîvekirî bimîne, afirîner be û bala wî li ser fêrbûna inglîzî bimîne.

Şîret #1: Bizane ka çi te motîve dike!

Mohammed li ser hindê hûr bû ka inglîzî dikare çawa bibe alîkar ku ew bi riyên cuda piştgiriya malbata xwe bike. Gava ew li Misirê bûn endamekî malbata wî gelekî nexweş bû û wî dixwest wekî li Misirê li UKê jî di randevuyan de li balê be. Wî dizanî ku fêmkirin û axaftina inglîzî dê rê bidê ku ew pergala tenduristiyê ya UKê fêm bike û alîkariya pêwîst wergirin.

Her wisa, li gorî Mohammed, ew wekî zilamekî ereb giringiyê dide piştgirîkirina malbata xwe û ew ji temenekî ciwan ve dixebite. Li Sûriyeyê gava lîse dixwend jî ew li xwaringeha apê xwe xebitiye û gava li Misirê jiyaye ew hefteyê heft rojan xebitiye û kêma rojan bêhna xwe daye. Niha li UKê jî ew giringiya qezenckirina pereyan ji bo piştgiriya malbata xwe hîs dike û ew dizane bêyî zanîna inglîzîyeke baş ev ne pêkan e.

Nexwe alîkariya malbata hûn piştgiriya didinê bikin ku bizanin ka çi wan motîve dike! Dibe ku ev peydakirina karekî be, standina destûreke ajotinê be yan jî ji bo şiyana alîkariya spartekên dibistanê yê zarokên xwe be.

Şîret #2: Ji teknolojiyê bi awayê herî baş sûdê wergirin

Beriya pandemiya Covid-19ê jî Mohammed fêm kiriye ku fêrbûna serxetî ya bi serê xwe rê didê ku bi awayê herî baş û yê lêhatî fêr bibe. Hin riyên wî yê favori yê bikaranîna teknolojiyê ji bo fêrbûnê ev in:

- Bernamoka Google Assistantê li telefona xwe bar bikin û bi deng pirsên têkildarî gramer û rastnivîsê lê bikin. Hûn dikarin ji bernamokê bipirsin ku hin peyvên

diyar bilêv bike, dengên cuda telefuz bike û her wisa pirsên gramerî bikin - hw.
"cudahiya few û some" çi ye?

- Bernamoka [eJOY English app](#) bi kar bînin ku jêrnivîs li vidyonên we yê Youtubê û malperên din bîn zêdekirin. Ev destûrê dide ku hûn peyvên di dema temaşekirinê de fêr bûne qeyd bikin û her wisa dikare we derbarê peyvên hûn ji vidyoyê fêr bûne de test bike.
- Heke hûn xwe bi xwe motîve dikin, ango li malê dixebitin, temaşekirina vidyonên ESOLê li ser Youtubê dikare bibe rîyeke baş ku hûn li ser mijarên divê hûn lê konstantre bibin hûr bibin. Bi taybetî di destpêkê de ku wê çaxê mirov fedî dike şaşiyar bike, hûn dikarin tiştên hûn ji vidyoyan dibihîzin dubare bikin heta hûn xwe aram hîs bikin û ji bo hînbûna gramerê ya zehmet zêdetir wext veqetînin.
- Vidyoyên Youtubê li ser mijareke têkildarî xwe wekî MP3 bar bikin ser amûra xwe û li malê yan jî li deverine din lê guhdarî bikin. Bi vî awayî dengê inglîzî wê her car di guhên we de be. Heke hûn jixwe tiştêkî dizanin, ji ber ku hûn mijarê dizanin û dikarin li ser peyvan hûr bibin, ev çêtir e.

Şîret #3: Li ser wan tiştan hûr bibin ku hûn pê re eleqedar in

Sala par Mohammed fêr kir gava li ser tiştêkî pê re eleqedar e hûr dibe zêdetir peyvan û bi awayekî zûtir fêr dibe.

Heke hûn eleqedarê sporê ne, li nûçeyên sporê guhdarî bikin û aghiyên li ser tîma hûn jê hez dikin bixwînin yan jî maçan ne bi zimanê xwe lê bi inglîzî guhdarî bikin. Heke hûn ji polîtîkayê hez dikin, hewlê bidin ku nûçeyan bi inglîzî temaşê û guhdarî bikin. Heke hûn dildarên helbestê ne, inglîziya helbestên jê hez dikin peyda bikin. Heke hûn dîndar in, hewlê bidin ku diayan bi inglîzî jî bixwînin. Hûn dikarin Quranê bi inglîzî û bi erebî li ser amûra xwe bar biki û bi her du zimanan li kêleka hev bixwînin ku peyvên nû fêr bibin.

Şîret #4: Hîmekî qewî deynin

Ji bo Mohammed aliyê herî zehmet yê fêrbûna inglîzî ev bû ku tîp li gorî peyvan yan jî li gorî koka peyvan dengên cuda derdixin. Ji ber ku koka inglîzî ji gelek zimanan tê, rêgezêkî diyar nîn e. Ji ber vê sedemê, giring e ku mirov zanibe kombînasyonên tîpên cuda dengên çawa derdixin (mînak ing, ish, ist, sh).

Şîret #5: Biryara sedema fêrbûna inglîzî bidin

Ev ê alîkariya we bike ku hûn li ser hindê hûr bibî ka hûn ê çi çawa fêr bibin. Ji bilî ji bo peywendîdana bi kesên derdorê re, hûn dixwazin inglîzî ji bo dewamkirina perwerdhiya xwe yan jî ji bo peyda kirina karekî fêr bibin?

Heke tu bixwazin bixebitin, bêtir li ser axaftin û guhdarîkirinê hûr bibin. Gramer û rastnivîs dê heta astekê giring bin lê ji bo gelek karên hûn serî lê bidin tiştê giring şiyana têkilîdanîne ye.

Heke hûn bixwazin perwerdehiya xwe dewam bikin, li ser gramerê hûr bibin û wekî we di zaroktiyê de kiriye, vegezin tiştên bingehîn. Bi hîmê zanîna xwe ya zimên bawer bin û li

serî zêde bikin. Ev ê ji bo nivîsandinê ku ji bo perwerdehiyê giring e, ji we re bibe alîkar.
Şiyanên guhdarîkirin û axaftinê dê li ser wî hîmî ava bibin.